



# T Ê K O Ş E R



HEJMAR 30

KANÛN 1985



revue trimestrielle

driemaandelijks blad



**TEKOŞER:** KOVARA TEKOŞER, YEKİTIYA KARKER Û XWENDEKAREN KURD LI BELÇİKA

**NAVNIŞAN:** B.P. 33 - 1730 ZELLIK - BELGIQUE

**BUHA:** 40 F.B., 2 DM, 6 FF.


**N° BANKE:** 426-3144071-85  
K.B. - BELGIQUE

**BERPIRSIYAR:** M. Nezh YALÇIN


**KOMITA NIVISKARIYE:** Ahmed, Derwêş, Pervîn, Yalçin

## T E D A Y I

WENEYEN ÇAR NIVISKAR Û HUNERMENDEN KURD EN KU ÇON DILOVANIYE .....	R. 3	
KURTENIVISA DAXWUYANIYA FERMI YA ENIYA DEMOKRATIKA IRAQI - COD .....	R. 4	
PIRSA KURDAN LI PARLAMANA EWRUPA .....	Pervîn .....	R. 5
REZIMANA KURDI .....	Celadet BEDIR XAN Û R. LESCOT .....	R. 6
QEREÇI Û MELKE .....	Mihdi .....	R.11
DIROKA KURDISTANE DI ANSIKLOPEDIYA ISLAME DE .....		R.12
GIYAYEN HOV EN KURDISTANE .....	Yalçin .....	R.15
VEBONA NAVENDIYA KURDISTAN LI HOLLANDA .....		R.15
ALIKARIYA CIVAKA BIYANIYAN .....	Derwêş .....	R.16
DU ŞEVEN AGAHDARIYE .....		R.19
XEBATA ME .....		R.19
CEJNA 30 SALIYA ŞIVAN .....		R.21
TEKOŞER'DEN HABERLER .....		R.22
AX JI DERDE VAN BEBEXTAN .....	Şahîne Sorekli .....	R.23
KURŞUN NEYLESIN TURKUYE ?! .....		R.23




YILMAZ GÜNEY  
1937 - 1984



CIGERXWIN -  
1903 - 1984



ELADÎN SICADÎ  
1915 - 1984



QENATE KURDO  
1909 - 1985

IRAQI NATIONAL DEMOCRATIC FRONT

-I.N.D.F.-

الجبهة الوطنية الديمقراطية العراقية  
(جود)

KURTENIVISA DAXWUYANIYA FERMI YA ENIYA DEMOKRATIKA IRAQI - CUD

Di dawiya meha Çotmehê de, rûniştevanên bajarên Kürdistana Iraqê dijî rêzana şovîni û diktatorî ya rejîmê Iraqê û dijî şerrê Iraq û Iranê yê xwîni derketin.

Li bajarê Sileymaniyê, piştî kuştina du kesan ji hêza leşkeriya balefirî, faşîstan dijî vî bajarî êrişeke pirr dijwar kir. Li hemberî vê êrişê, xelkê Sileymaniyê mangirtina (grêv) giştî û xwepêşandinên (meşîn) ku leşker bi agir belav kirin pêk anîn.

Hikûmet derketina derve qedexe kir û riya Sileymaniye-Kerkûkê girt ku ev nûçe negihêje bajarên din. Lê gel derket derve û xwepêşandinan pêk anîn, û leşker ew bi balefirên hêlikoptêr belav kirin. Di van lihevxiştinan de, yek ji hêzên leşkerî mir û hinên din birîndar bûn. Ji aliyê gel şerî meriv gorî bûn û jimareke mezin birîndar bû.

Di 23 Çotmehê de, 20.000 leşker, cenderme û polis ji Kerkûkê hatin û xaniyan yek bi yek geriyên ji bo ku şoreşgeran û kesên dijî şerr peyda bikin. Her xaniyekî ku tê de yek ji wan hat dîtin, yan ku leşker gûman dikir ku tê de yek ji wan hebû, dihat hilweşandin. Jimara xaniyên hilweşayî gihajt 120. Bi ser de jî, ev hêzên leşkerî kuştinên komî pêk anîn, agir berda 13 xort, di mehella Ashab Sabî de, û 10 rûniştevanên din li hemama gelerî, Nalî, li Sileymaniyê. Hemî tavil gorî bûn.

Carek jî, faşîstan 8 rûniştevan, di gorgeha (mezar) bajêr de, sax hatin gor kirin. Ev cara duyemîn e ku bajarê Sileymaniyê êrişeke ewha hov dijî. Di 9 Hezîran 1963 de, ev canî bixwe 128 rûniştevan di kortalekê tenê de, sax gor kiri bûn.

Di roja 4mîn de, karkerên cigarexanan û yên karxanên din ên bajêr xwe gihand gel û karên xwe rawestand.

Di tevayiya vê êrişê de, li Sileymaniyê çend hezar kes hatin girtin û jimara goriyan gihajt 200, gelek kes jî birîndar bûn.

Faşîst ewqas har bûn ku di girtîgehan de kuştinên komî yê girtiyên rêzanî (siyasî) pêk anîn. Di girtîgeha Mûsilê bitenê de, 69 şoreşger hatin kuştin.

Di vî zemanî bixwe de jî, malîyên pêşmergan û yên kesên ku dijî şerr in - li Suleymaniyê bitenê 112 malî - hatin dūr

xistin, û tu kes hîn cihên wan nizane.

Li Erbilê, hêzên faşîst xwest ku dora gelek mehellan bigirin, ji bo ku rûniştevanên vî bajarî xwe negihînin ên Sileymaniyê. Lê xelk xwe di kela xwe de veşart, û ji bo cara yekemîn hin caş jî xwe gihand wan. Li gel hêlikopterên ku kelê bombe dikir, gelê Erbilê xwe ragirt û leşker neçar (mecbûr) kir ku vegere.

Li Dehok, Mûsil, Zaxo, Amadya û Kerkûkê, xwepêşandinên gelerî, bi awayên cihê fireh bûn.

Ji destpêka vê salê, hikûmeta faşîst dora navçeyên rizgarkirî ku tê de bi sed hezaran welatparêz û hevalên tevgera niştîmanî ya dijî hikûmetê dijîn digire û nahêle ku xwarinên bingehî bigihêjin wan yan jê derkevin. Û bi ser de jî, gelek gund bombe kirin ku ew vala bibin û bi vî awayî berengariya (xwe parastin) gelerî bişikîne.

Ji destpêka îlonê, bi sedan dibistan ji aliyê hikûmetê hatin girtin. Heta nuha, jimara dibistanên pêşînên girtî li navçeya Dehokê gihajt 208, û yê Erbilê 200. Di destpêka Çotmehê de, dibistana navîn "Bira-yetî" li navenda Dehokê hat girtin û xwendevanên wê li dibistanên bajarên din hatin belav kirin.

Hikûmeta faşîst av û elektrîk ji malîyên pêşmergan yan ên partiyên dijîtiyê yan jî yê kesên ku dijî şerr in jêdike.

Ev serhildana gelerî ku bajarên Kürdistanê dijîn nîşan dide ku gelê me yê Iraqî hemî hêzên xwe yê şoreşgerî dide hev ji bo ku şerrê Qadisîyyê rawestîne, ji diktatoriya faşîst rizgar bibê û Iraqa dêmokratîk ava bike.

Eniya Netewiya Dêmokratîka Iraqî (Cûd) cardin te'kîd dike ku jê çiqas bê ewê vî barê netewiyê giring bîne cih.

12 Mijdar 1985

# PÛRSA KURDAN LI PARLAMANA EWURUPA

Pervîn

Di tarîxa 23.10.1985 de, Parlamana Ewropa li Strasburg civiya û biryareke giring li ser Tirkîyê stend.

Ji bo ku Parlamana Ewropa ji nuh de pêwendiyên xwe bi Tirkîyê re bike, jê re pênc merc (şert) pêwîst in:

- 1- Rakirina hikmê îdamê ji bo cinayetên rêzanî (siyasî) yê ku bê kuştin hatine kirin, û buhurîn (af) ji bo girtiyên ku ji sedema dîtinên xwe hatine ceza kirin.
- 2- Rawestandina êşandina (işkence) girtiyan û cezakirina merivên ku vê êşandinê dikin.
- 3- Rawestandina dozên (dawa) koman û di cihê wan de dozên dad (dawayên adil) pêkanîn.
- 4- Mafê her Tirkekî ji bo gilîkirinê li ber Komisyona Ewropî ya Mafên Mirovîyê (li Konseya Ewropa).
- 5- Hilanîna sînoran li ber azadiyên rêzanî, civakî û dîtinî.

Ji 287 parlamenterên ewropî, 159 vê Biryarê pejiwand (qebûl kir), 119 dijî wê derketin û 10 bêdeng man. 3 parlamenterên belçkîyên flaman pêşneyaran li ser mafê gelê kurd kirin.

Berê ku Parlamana Ewropa vê biryarê bistine, Komisyona wê ya Rêzanî parlamenterê sosyalîstê ingilîz, Richard Balfe (1), di 12-17 Gulan 1985 de, şand Tirkîyê, ji bo ku rewşa wê baş nas bike. Lê, li wira, wî nikarî bû girtîgehan bibîne û bi berpirsiyarên hikûmetê re bipeyive.

Ev bûyer, ji bo me Kurdan, gelek giring e. Ev cara yekemîn e ku zordestiya ku li ser gelê me dibe, bi awakî vekirî, ji aliyê Parlamana Ewropa tê protesto kirin: Em li jêr, li ser vê yekê, çend bendên giring nîşan didin:

**Bend M.** Mixabin, awayên gelek cihê yê pelixandina mafên mirovî yê hindikayiya kurdî li Tirkîyê, û bi hêzanî yê kesên ku bi awakî rêzanî xwe weka Kurd nîşan didin, hîn jî dajon (dewam dikin).

**Bend T.** (Parlaman) dibîne ku berpirsiyarên

tirk mafên hindikayiyan nijadî (etnikî), heta gava ku ew bi peymanên navnetewî hatine dayîn, tîndî pelixandin.

Piştî benda T'ya dawîn, Parlamana ji hikûmeta Tirkîyê tiştên giring xwestin. Ji wan jî:

**Bend 2, g:** Dayîna mafên hindikayiyan, yê olî (dînî), zimanî, dîrokî û yê xebatên çandî û civakî.

**Bend 4:** (Parlaman) ji serokê xwe dixwaze ku ew vê Biryarê, li Komisyona û Konseya, ji wezîrên Karên Derveyî ku di nav çarçeva hevkarîya rêzanî de dicivin, hikûmetên dewletên endam, Konseya Ewropa, hikûmeta Tirkîyê û Meclisa Mezina Netewî ya Tirkîyê re bişîne.

Em baş zanin ku ne bi saya vê biryarê, lê bi ya têkoşîna gelê kurd bixwe emê mafê xwe bistînin. Lê, rast e jî ku tu şoreş, gava ku bitenê li hundurê welêt çêdibe, bê ku dengê xwe li cihanê bide bihîstin, di vê dawîya sedsala XIXmîn de nikare serfiraz bibe.

Tevgera me divê li hundir û li derve, bi awayên cihê, lê girêdayî hevdu, heta serfiraziyê baje.

DE LUCHT IS ZWAAR ALS LOOD

TURKIJE 5 JAAR NA DE STAATSGREEP



Een uitgave van het Internationaal Ontmoetingscentrum.

(1) R. Ralf li hemî cihanê ji bo mafên mirovî têkoşînê dike. Lê hestê (his) wî yê taybetî (xusûsî) ji bo Tirkîyê heye, ji sedema pêwendiyên wî yê rojî bi rûniştevên Tirkîyê re, li Basûrê London. Ew endamê Amnesty International e û ji 1981, di Komîta Parastina Mafên Mirovî li Tirkîyê de dixebite.

# R Ê Z Î M A N A K U R D Î

Mîr Celadet BEDIR XAN û R. LESCOT (\*)

(Zaravê Kurmancî)

- III -

## II. DENGDER

6. Dengdêrên kurdî heşt in: a, e, ê, î, î, o, u, û. Meriv kare wan, li gora bingehên cihê, veqetîne çend koman:

Eger meriv giringî bide jimara wan, 3 dengdêrên kurt (e, u, î) û 5 dengdêrên dirêj (a, ê, î, o, û) vediqetîne. Ev cihêkirin bingehî ye.

Û meriv kare jî wan li gora cihê ezmanê ziman ku ew tê de tên bi lêv kirin rêz bike. Wê çaxê, meriv 3 dengdêrên pêşîn:

î, ê, e; 2 dengdêrên tevlihev: î, u, û; 3 dengdêrên paşîn: a, o, û, dibihîse.

Pêwist e meriv bala xwe bide ku dengdêrên kurt û yên weka wan, ên dirêj, dengên wan cihê ne û ji rawestên (nuqte) bilêvkirinê yên pirr cihê derdikevin.

Di dawiyê de, eger em bala xwe bidin bicihbûna zimên di planê bilindbûnê de, emê dengdêrên bilind (î, û, î, u), ên navîn (ê) û ên nizm (e, a, o) ji hev cihê bikin.

D I R Ê J			K U R T	
	Pêşîn	Paşîn	Pêşîn	Tevlihev
Bilind	î	û		î, u
Navîn	ê			
Nizm		a, o	e	

Di fêslê yekemîn de, me giringiya dengdêran nîşan da bû. Nuha, emê lêhûrnêrînekê li ser giringiya dengdêrên ku cihêtiyên wan ên balkêş hene bi tefsîl çêkin.

### A. DENGDERÊN KURT

7. Dengdêrên kurt 3 ne: e, î, u. Em îcar zanin ku tu deng bi fransîzî weka wan tu neye. Duduyên pêşîn: e, î, weka ku emê paşê bibînin (hevîgirtin), di bingeha sistema dengiya kurdî de ne. A siyemîn (u) nuh e.

8. E- Dengdêra paşîna nizm. Ev dengdêr kare di paşîya yan di pêşîya her dengdarekê de bibe. Ew weka unsurê pêkanîna dengdêrên dirêj, a, ê, û, î, ava dibe (li dûrtir binêre).

Gava ku gotinek bi "e" diqede û nîşaneke ku bi dengdêra "e" bixwe dest pê dike dis-

tîne, her du "e" karin, li gora zaravan, yan bi "y"eke ahengî ji hevdu veqetin, yan jî xwe bi "a" yan "ê" hevdu bigirin: Mase: maseyek, masak, masêk.

Bi vî awayî jî, "e"ya dawîn ku nîşana "ê" yan "a" piştî wê tê, kare yan hunda bibe, yan ji nîşanê bi "y" veqete. Mase dibe: maseyê yan masê (awayê têrkera yekejmar); maseyên min yan masên min; maseya min yan mase min; maseyan yan masan.

9. I- Dengdêra tevliheva bilind. Bi awakî giştî, tu gotineke kurdî bi "î" dest pê nake û naqede.

Lê, ev dengdêr dibe tîpa dawîn a daçekên "di", "ji", "li", a pronavê "çi" û a raweyên bi "î" (hati, di hati bûn de). Nîşan û pronavê ku me li jor gotin jixwe tucar bitenê nayên dîtin; hemî di peyvê de, ewqas zû tên bi lêv kirin ku dibin weka perçekê

(\*) Grammaire Kurde, Librairie d'Amérique et d'Orient, Paris 1970. Wergerandin: Fransîzî-kurdî: Pervîn.



ji gotina ku tê piştî wan. Eger em werin raweya "i", ew bitenê di kesandina hin demên hevedudanî de, û bi taybetî hergav bi alîkariya "bûn" xuya dibe.

**NIŞANK I.** Gotinên kêm ku di destpêka wan de "i" heye biyanî ne. Ew pirr caran ji erebî hatine stendin. Di wan de, "i" ji ع yan I 'yeke bi "kesre", bi erebiya bêjeyî (edebî), tê. Nîşe: Izin:(إذن); îşaret:(إشارة), insan:(إنسان), imza:(إمضا).

Jixwe, di piraniya peyvikên çiyayî de (Botan, Xerzan û hwd.), ع û I 'ên destpêka gotinan, ên erebî, ku bilêvkirina wan ji bo Kurdan zor de, bi dengên "hi" yan "î" hatine guhertin. Li gora navçeyan, "hizin" yan "îzin" (إذن), "hinsan" yan "însan" (إنسان), "hişaret" yan "îşaret" (إشارة), "himza" yan "îmza" (إمضا) tînan gotin. Awayên "izin", "insan", "işaret", "imza".... bitenê ji aliyê bajariyan û hin rûniştevanên deştan, ku ji sedema pêwendiyên bêtir bi biyaniyan re, hînî bilêvkirina wan bûn, tînan bi kar anîn. Divê em bala xwe bidin ku ev awayê dawîn ê bilêvkinê, eger ne li gora rêzikên fonetîka kurdî be jî, îro di zimanê nivîsînê de ku bi saya bajariyan û gundiyên Kurdistana Rojavaya Başûr ava dibe bêtir cih digire.

**NIŞANK II.** Me berê nuha dît ku alfabeya kurdî bitenê fonetîk e û ku di xwendinê de her tîp divê bê bi lêv kirin. Nuha baş e em nîşan bidin ku "i", û ew bitenê, carna ji vê rêzikê derdikeve. Bi rastî, her "i"yeke ku di kîteya dawîn a gotinekê de xuya dibe, gava ku tê pêşiya gotineke ku bi dengdêrekê dest pê dike, yan bi tesaduf nîşanekê distîne, hunda dibe. Bi vî awayî, "kevin", eger piştî wê "e" hebe, hergav "kevin" tê nivîsîn, lê "kevn" tê bi lêv kirin, û ev hundabûn pirr caran di nivîsînê de, ku hîn rêzikên wê divên bînan tesbît kirin, xuya dibe. Nîşeyên jêrîn ewê vê rewşê baştir nîşan bidin:

- Qetila wî helal e: di xwendinê de : "qet'la wî helal e".
- Ev çi bihin e?: di xwendinê de: "ev çi bih'n e?".
- Bi remilê dizane: di xwendinê de: "bi rem'lê dizane".
- Ma eqilê wî heye?: di xwendinê de: "ma eq'lê wî heye?".
- Ji qehiran mir: di xwendinê de: "ji qeh'ran mir".
- Rikinên Birca Belek: di xwendinê de: "rik'nên Birca Belek".
- Ez di vê fikirê de me: di xwendinê de: "ez di vê fik'rê de me".

**NIŞANK III.** Li gel vê qasê, eger unsurê ku radigihê gotinê, îcar ne bi tesaduf, lê bi

awakî muntezem cih digire, weka di paşdaniyekê yan di beşa duyemîn a navekî de û yan jî di rengdêreke hevedudanî de, "i"ya ku nema tê bi lêv kirin ji nivîsînê jî hunda dibe: Bihin-ok dibe "bihnok". Kevn-ar dibe: "kevnar", "kevnare".

Di vajayê (eksê) wî de, di nîşeyên jêrîn de, "i"ya ku bilêvkirina wê dajo (dewam dike), di nivîsînê de jî dewam dike:

Sêhir-baz dibe sêhirbaz. Eqil-mend dibe eqilmend. Bihin-dar dibe bihindar.

10. Derbasbûna "e" ber bi "i" û ya "i" ber bi "e":

Bi kurdî, weka di zimanine din ên îranî de, dengdêrên "e" û "i" ne sabit in. Di hin gotinan de, dibe ku ew cihê hevdu bigirin. Bi vî awayî, "tejî", "mirov", "çel", "xerab" û hwd. pirr caran, di peyvikê bixwe de, bi awayên: tijî, mirov, çil, xirab, û hwd. tînan dîtin.


11. U- Tevliheva bilind. Ev dengdêreke pevdengî ye ku ji tevlihevbûna "w-i" çêbûye. Em wê bitenê di jimareke piçûk a navan de dibînim, ji bo ku xuyabûna wê nuh e.

**NIŞANK.** U'ya ku dengê wê sabit e, divê ku ji raxhatina tesadufî ya "w" û "i", ku di gotinên guhertî de tê dîtin, bê cihê kirin. Bi vî awayî, lêkera "xwarin", di kesê yeke-minê yekejmar ê dema niho ya raweya pêşker de, dibe "dixwim", û di sê kesên gelejmar ên vê demê bixwe de dibe "dixwin". Ev her du awa tucar "dixum" yan "dixun" nayên nivîsîn.

EMIR DJELADET BEDIR KHAN  
et  
ROGER LESCOT

**GRAMMAIRE KURDE**  
(Dialecte kurmandji)

*Ouvrage honoré d'une subvention  
du Centre National de la Recherche Scientifique*



LIBRAIRIE D'AMÉRIQUE ET D'ORIENT  
ADRIEN MAISONNEUVE  
11, rue Saint-Sulpice, Paris (6<sup>e</sup>)  
1970

12. Ji derveyî istisnayên kêm, "u" bitenê piştî dengdarên g, h, k, q û x tê dîtin. Nîşe: Gur (gwir), hundir (hwindir), kur (kwir), gul (gwil).

Di hin gotinan de, dengdarên din tên pêş "u". Nîşe:

- Tu: pronavê (zemîr) kesîn, kesê 2mînê yekejmar.
- Tu: rengdêr (sifet) û pronavê nebinavkirî.
- Du: awayê rengdêrî û pronavî yê "dido".
- Sund: jixwe ev awa bitenê di peyvikên ku tê de "s" carna weka **س** 'ya erebiya xurt û ku ji sistema fonetîka kurdî dûr e tê bi lêv kirin tê dîtin. Di hemî peyvikên din de "sond" tê gotin.

**NIŞANK I.** Di lêkerên weka guhartin, guhastin, guvaştin de, ku di rayê (esl) xwe de diviyan: gwihartin, gwihastin, gwivaştin bèn nivîsîn, di gelek navçeyan de bi awayên: gihartin, gihastin, givaştin tên bi kar anîn. Dibe ku ev netîca pêşveçûneke bêtir be, ji bo ku tê de dengê "w" tê rakirin.

**NIŞANK II.** Di beşa Rojavaya Kurdistanê de, di bin tesîra melleyan de, ku di dibistanên kur'anî de xwendin, "u" pîrr caran cihê damma (') ya gotinên ku ji erebî hatine stendin digire. Bi vî awayî, ew dengê xwe yê rayî (eslî) hunda dike û weka "û"yeke pîrr kurt tê bi lêv kirin û ew kare di dû her dengdarekê de were. Lê ew serbestî di rêzikên fonetîka kurdî de bitenê di hin navçeyan de heye. Li her derên din, bi hêzanî li Rojavayê ku tê de ziman ji pêwendiyên bi zimanên biyanî xwe parastiyê, damma (')yên ku di gelek kêm gotinên ku ji erebî hatine stendin tên dîtin cihê "i" stendine, ji bo ku di kurdî de tu tîp weka damma tu neye: **مراد** : mirad, **مدير** : midir, **مهم** : mihim.

Gotina erebî **مقر** (muqir: merivê ku itiraf dike) gava ku bi kurdî hat bi kar anîn, qedereke wê ya ecêb çêbû: dammaya "m" diviya ku bi "u"yekê û kesra (/) "q" bi "i"yekê bihata guhartin. Lê, weka ku "u" kare bitenê dû tîpeke qirikî were, her du dengdêr cihê xwe guhert û ev gotin bû "miqur". Di dawiyê de, di dawiya vê guherîna de, "k" cihê "q" stend, yan ji bo ku bilêvkirina wê hêsantir e, yan jî ji sedema wekheviya ku di navbera kîteya "qur" û gotina kurdî "kur" de heye ye. Bi vî awayî, gotina erebî "muqir", bi kurdî "mikur" tê bi kar anîn.

13. Dengdêra "u" nikare tucar were dû "w". Ango, pronavên "tu" û "du", dêlva ku di awayê têrkeriyê gelejmar de bibin "tuwan" û "duwan", dibin "tiwan" û "diwan". Em baş nîşan bidin ku "u" tê pêş "y", bê ku biguhere.

## B. DENGDERÊN DIREJ

14. Di kurdî de pênc dengdêrên dirêj, a, ê, î, o, û hene.

A- Tu cihêtiyeke wê ya taybetî tu neye. Di benda 71 de, emê li çend awayên wê binêrin.

15. Î- Li gel ku ev dengdêr, di rêza alfabe-yî de, piştî "ê" tê, emê di destpêkê de li ser wê lêhûrnêrînekê çêkin, ji bo ku têgihajtina wê hêsantir bibe.

Dengdêra "î" nikare tucar berê "y" were. Gava gotineke ku bi "î" diqede nîşaneke ku bi "y"eke ahengî (yan bi "h"yekê, di hin peyvikan de) dest pê dike distîne, dengdêra wê ya dawîn bi "i" diguhere.

Nîşe: Ronahî (awayê têrkerî): ronahiyê.

Piçûkahî (awayê têrkerî): piçûkahiyê.

**NIŞANK.** Gava ku gotineke ku bi "î" diqede tê berê gotineke din ku bi "y" dest pê dike, "î"ya dawîn cardin "i" tê bi lêv kirin, lê nivîsîna wê ya tebîî dimîne.

Nîşe: Ev kî ye?: di xwendinê de: Ev ki Ye?

Ev derzî ye: di xwendinê de: Ev derzi ye.

Lê, eger rêzaya (mana) hevokê (cumle) di-xwaze ku dengê me di navbera gotina ku bi "î" diqede û a ku di dû wê de tê û bi "y" dest pê dike raweste, divê em di bilêvkirina "î" de dewam bikin. Nîşe: Ev derzî, ya min e.

16. Ê- Weka "î", "ê" jî nikare tucar berê "y" were. Sedema vê yekê dibe ku nêzîkbûna dengê "ê" û "î" be; bi vî awayî, zagona (qanûn) ku ev tîpa duyemîn di bin wê de ye digihêje ya yekemîn.

Gava gotineke ku bi "ê" diqede nîşaneke ku bi "y" dest pê dike distîne, dengdêra wê ya dawîn bi "e" tê guhertin.

Nîşe: Pê: peyên min, van peyan.

Rê: reya min, di vê reyê re

Dê: deya min, vê deyê (awayê têrker)

**NIŞANK I.** Nîşanka ku me ji bo "î" goti bû (bend 15) ji bo "ê" jî dibe: gava gotineke ku bi "ê" diqede tê berê gotineke din ku bi "y" dest pê dike, "ê"ya dawîn "e" tê bi lêv kirin, lê nivîsîna wê weka xwe dimîne.

Nîşe: Tu kurê kê yî?: di xwendinê de: tu kurê ke yî?

Kitêb li ser masê ye: di xwendinê de: kitêb li ser mase ye.

**NIŞANK II.** Di hin peyvikan de, û hergav ji sedema nêzîkbûna "ê" û "î", "ê"ya ku piştî wê "y" tê dibe "i", ne "e". Eger em li nîşeyên pêşîn ji nuh de binêrin:

Pê: piyên min, van piyan.



Rê: riya min, di vê riyê de.

Dê: diya wî, vê diyê.

tiştêkî vekirî ye ku ewê tevlihevî karibin ji guhertina "e" bi "i" derkevin. Bi rastî, gotinên rê û rî (bi tirkî: sakal), ewê her du, di awayê têrkerî de, bibin "vê riyê", herweha ya yekemîn (rê) diviya bia "reyê". Bi vî awayî bixwe jî, "pê" (bi tirkî: ayak) û "pî" (umuz), her du jî dibin "piyê" min.

Zimanê nivîsînê bêtir dixwaze ku rêzika ku di destpêka vî bendî de hatiye nîşan dan tetbîq bike, ji bo ku tê de ev tevliheviyên ku hatin gotin çênebin.

**NIŞANK III.** Guhertina "ê" û "î" bi "e" û "i" li ber "y" biyaniyê ku dest bi hînbûna kurdî dike şaş dike. Carna meriv bi zorê awayê mutlaq ê gotineke ku bi nîşana -eyê, -eya, -eyî, -iyê, -iya, -iyî, û hwd. diqede dibîne. Ji bo vê yekê, baş e meriv ji bîr neke ku tu navêkî kurdî bi "î" naqede. Bi vî awayî, di "tiyê", "braziyê min" de, awayên "tiyê" û "braziyê" bitenê karin ji "tî" û "brazî" bîn.

Bi vî awayî bixwe jî, ji bo ku nîşanên ku navên ku bi "e" diqedin, bi awakî giştî, bi dengdêra dawîn re hevdu bigirin, awayine weka "derpeyê" yan "brazeya" (di derpeyê min, brazeya min de) ji "derpe" yan "braze" ku tu nene, bêtir nêzîkî "derpê" yan "brazê" dibin.

Lê, eger meriv rastî peyvekeke ku tê de serbestiya ku li jor hat nîşan dan (nîşank II) tê pejirandin (qebûl kirin) bê, pirs zor dibe û bitenê axaftina vî zimanî çara wî dibîne. Bi rastî, nîşeyên ku hatin gotin dibin: "derpiyê min", "braziya min", "xwarziya min", "diya min", û meriv di navbera "derpê" û "derpî", "brazê" (mê) û "brazî" (nêr), "xwarzê" û "xwarzî", "dî" (ku weka nav tu neye) û "dê", de tereddud dike. Di awayê "brazê" de, pirs ji ber xwe de rast dibe, ji bo ku zayenda (cins) wî bi veqetandeka "a" hatiye nîşan dan. Lê eger ev gotin gelemjmar bana, zayenda wan ewê nema xuya biba: "braziyên min" û "xwarziyên min" (mê û nêr). Ji bo vê yekê, divê meriv li gora rêzaya hevokê biçe (mana cumlê) biçe.

17. Weka "e", "û", "i", "ê" û "î" jî karin cihê hevdu bigirin. Di hin peyvikan de, dêlva "bîn", "bên" tê gotin; dêlva "mêvan", "mîvan"; dêlva "fehêt", "fehî" û hwd. Ev awa bi hêzanî di raweyên fermanî (emr) de ku tê de yek ji van dengdêran heye gelek caran tê dîtin.

Bi vî awayî, li gora navçeyan, ewha tê gotin:

Bîne yan bêne, ji bo lêkera anîn.

Bihîle yan bihêle, ji bo lêkera hiştin.

Bimîne yan bimêne, ji bo lêkera man, û hwd.

SAL 2  
HEJMAR 21  
...  
YEKSEM  
1 NISAN 1934

# HAWAR

ANNÉE 2  
NUMÉRO 21  
...  
DIMANCHE  
1 AVRIL 1934

KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

DI VÊ HEJMARÊ DE

Kurd û Kurdistan	Herekol Azizan
Yewnaistan	Dr. K. A. Bedir-Nan
Mijde	Lawîkî Pijderî
Çuk û Fil	M. E. Botî
Kaxeza Eskere	Xwediyê Hawarê
Delalê Beryê	Stranvan
Çarînên Xeym	Dr. K. A. Bedir-Nan
Pendname	Gegerswin
Dêrik	Newzad
Stranên Botan	Str. Jeliyan
Tu çirê?	Hemoyê Qence
Xeymwari	M. E. Botî

BIRÊ FRENŞIZÎ

Le Beau de la Steppe	D. A. Bedir-Khan
Chansons de Bolan	Pirs. Kurdan

ÇAPXANA MÛHÜR-EL-MÛBKI  
ŞAM 1934

SAL 1-4  
HEJMAR 1-28  
1 NISAN 1942  
ADAR 1945

# RONAHÎ

ANNÉE 1-4  
NUMÉRO 1-28  
1 AVRIL 1942  
MARS 1945

SUPPLÉMENT ILLUSTRÉ DE LA REVUE KURDE HAWAR



Mîr CELADET BEDIRXAN  
Xwedî û Berpirsiyarê Kovarê

ŞAM 1942-1945  
ÇAPXANA SEBATÊ  
ÇAPXANA TIRIQIYÊ

BERHEVOK: ÇAPXANA JINA NÛ

18. O- Paşîna bilind. Weka "a", "o" jî kare dû her dengdarekê were, bê ku tucar ew xera bibe.

Girêdana ahengî, piştî "o", bi alfkariya "w" û "y" çêdibe.

Nîşe: Cowa avê yan coya avê (kanal)  
Stowê min yan stoyê min (stuyê min)  
Çowê wî yan çoyê wî (darê wî)

**NIŞANK.** Bikaranîna "y" weka dengdareke girêdanê piştî "o" (weka piştî "û" jî) bi hêzanî taybetiya (xusûsiyet) navçeyên rojavayî ye (li bendên 19 û 20 binêre).

19. O- Paşîna bilind. Dengdêra "û" kare bi her dengdarekê re here, ji derveyî "w" ku kare dû wê biçe, lê ne berê wê.

Gava gotineke ku bi "û" diqede nîşaneke ku girêdaneke ahengî dixwaze distîne, ev girêdan bi "w" temîn dibe û "i" cihê "û" distîne.

Nîşe: Tû, dara tiwê.  
Rû, riwê min.  
Ez biwam (lêkera bûn).

**NIŞANK.** Di navçeyên ku tê de "û" vedibe û dibe "u" (li bend 20 binêre), girêdana ahengî bi alfkariya "y" çêdibe, bê ku "û"ya dawîn bê guhertin.

Nîşe: Dara tûyê, rûyê min.

20. Li Botan, Behdînan û Hekarî, "û"ya

kurdiya tebîî bi dengdêra pevdengiya dirêj ku di navbera dengê "wî" û "û"ya fransîzî (mûr = tû) de ye tê guhertin. Ev deng kare bi "û" bê nivîsîn. Jixwe peyvikên ku ev "û" tê de xuya dibe bikaranîna "o" nizanin; ew vê "o"yê bi "û" diguherînin.

Nîşe: Kûr, dêlva kûr  
Şûr, dêlva şûr  
Dûr, dêlva dor (birc)  
Kûr, dêlva kor (çavên kor)

Ev "û" divê weka dengdêreke nehemîn ku bi nîşaneke taybetî (xusûsî) tê nivîsîn neyê hesabandin. Bikaranîna wê dêlva "û", di hin navçeyan de, û guhertina "o" bi "û" bitenê guhertinê navçeyî ne ku ji sistema dengiya kurdî hatine anîn, û di encamê (netice) de her du dengên tebîî "û" û "o" vedibin û dibin "û" û "û".

**NIŞANK.** Di navçeya Hekarî de, "bûn" "bün" tê bi lêv kirin. Lê, li Botan, ev lêker di bin awayê "bîn" de tê bi kar anîn (ji wê jî, di dema herî de: ez bîm, tu bî, ew bî, û hwd.). Rayê (eslê) vê taybetiyê ev e ku ji berê, di peyvikên ku "y" weka dengdareke girêdanê, piştî "û", bi kar tînin de, ev rader "bûyîn" bû (bûyîn tê bi lêv kirin), û di peyvikên din de "biwîn" bû. "Bûyîn" ewê xwe hev bigire û bibe "bün".

Balkêş e ku awayê "bîn" tucar di zimanê nivîsînê de cih ne stendiye. Helbestvan Melayê Cizîrî (sedsala Vxmîn), ku rayê wî ji Botan e, herdem "bûn" بون dinivîsî, li gel ku bê gûman "bîn" bi lêv dikir.

21. O- Ev tîp ji aliyê nivîskarê alfabeya kurdî hatiye hesab kirin, ji bo ku ew wê di nusrawên (tekst) zargotinê (folklor) de, dengê "ö" (bi fransîzî "oeu": weka di "oeufs" = "hêk" de) ku di kurmançî de hema tu neye, lê ku di hin peyvikên soranî de hene, binivîse.

**NIŞANK.** Dengdêra "ö", di kurmançî de, heta nuha bitenê di gotina "öks" de ku ji aliyê Beraziyên Başûrê (navçeya Urfê) tê bi kar anîn û ku rêzaya (mana) wê "heriya sor" e, hatiye bihîstin. Ev gotin, di cihên din de, heta bi awayê "oks" de, ne hatiye zanîn; dibe ku ew ji tirkî "ökse" (bi yûnanî ὄξος) hatiye.

Dengê "ö" ji sistema dengiya kurdî ewqas dûr e ku herdem, di gotinên ku ji zimanê din hatine stendin, ew bi "o" hatiye guhertin.

Nîşe: Soz, ji tirkî "söz"  
Donim, ji tirkî "dönüm".

Dûmahî heye

## MAMOSTAYÊ KURD

1

dengê beşê kurdi-  
xwendingeha berz ya  
mamostayeti li  
stockholmê ye

# Qereçî û Melkê

Mihdî

Rojek ji rojan, wek her car ji dema salê, payîzek xweş bû, zebeş û petîx pîrr bûn.

Qereçîyan li dora gundê Mizîzexê konên xwe danî bûn. Wek tê zanîn, qereçî li her navçên Kurdistanê hene û kar û barê wan ger, nêçîr û hunermendiya kemaçê ye. Debara xwe bi gerana malan temîn dikin, ji bo ku nanê zikê xwê ji gundiyan bistînin. Wan konên xwe li gundê Mizîzexê, di bêndera mala Melkê Hewîşko de, danî bûn.

Di rojê germ de, yek ji merivên qereçî diçe mala Melkê Hewîşko ku kêrikeke kurdî ji bo nêçîrê bikire.

Kar û barê Melkê Hewîşko, li cem cot, paleyî, kesax û çinîna rêsiyan, çêkirina kêrikan ji qilochên sewêl (pez û mî) e.

Ew jî wek pîrr kesan van kêrikên ku bes li wî gundî çêdibin, hem li gund û hem li bajêr, difroşe û beşekî ji debara malê pê hal dike.

Kêlîka ku merivê qereçî dikeve hindiru, li Melkê dinêre bê çawa ew ketiye ber kûri-ka êgir û kufe kufa wî ye ku êgir xweş bike:

- Roja te bi xêr be, Melkê!

Melkê silava wî wergirt û bixêrhatin dayê. Paş de cih jê re çêkir:

- Kerem bike rûnê.

Qereçî li kêleka Melkê, nêzîkî kurikê, dirûnê. Axaftin xweş dibe, li ser bûyer û meselên gund. Paşê, ew li ser bend û berberiya (pevçûn) gund dipeyivin. Li dawiyê, qereçî kêrika xwe werdigre, diravên wê dide Melkê, radibe ser xwe û xatir ji Melkê dixwaze, derî li ber xwe digre û diçe ber bi konê xwe.

Piştî ku qereçî ji cem Melkê derdikeve, evê dawîn li xelîtkî xwe ya diravan digere. Çi mixabe, Melkê xelîtkî xwe nabîne. Terqênî (tirs) dikeve ser dilê wî. Di cih de dirabe û dide pey qereçî. Li devê hewşê bi qepira (pişt) qereçî digre û bi hêrs:

- Dirav û xelîtkî min deyne. Te xelîtkî min ya diravan dizî. Zû derxe bê tê ji ku derxî!

Qereçî sûnd bileh dixwe ku ti hayê wî ji xelîtkî wî nîne. Zêdetirî seetekê li ber hev dixin. Ti tişteki ji hev saff nakin. Li dawiyê, gava ku her du jî hew çare dibînin, hevdu dawetî şerîetê dikin. Ji bo şerîetê, li merivekî navser û bê alî difikirin. Melkê Babekir pêşneyar dike. Her du didin pey hev û diçine mala Babekir.

Dem a ew çûn ba Babekir, ew bi kurê xwe Silho re pev diçû û hezar û yek nifir

jê re dikirin. Qereçî û Melkê silavan lê kirin. Babekir dev ji kurê xwe berda û hat li rex mêhvanên xwe rûnişt:

- Li vê ecêba kesî ne dîtî û zarokên vê heyamê wê dinyayê xwin. Tew û sed carî tew li me belangazan be.

Melkê dît ku bêhna Babekir teng e, silav nû kir û şîreta ku bêhna xwe fereh bike lê kir. Qereçî li Melkê vegereha û bi awakî tolatî:

- Ha hê ji nû de te rastiye got mam xulam. Bêhna te fereh e heta ku tu ji xelkê re şîreta bêhnferehbûnê bikî!

Her du merivan mesela xwe ji serî ta dawî ji Babekir re got. Dîsa wan seetekê li ber hev da, sund xwar û ti tişt ji hev saff ne kir. Ew dibê te biriyê û yê din dibê na. Melkê ji Babekir re dibêje:

- Tu hakimtiya me bike, emê niha a dawî bikin. Lê bi şerta ku tu çavên xwe baş vekî ta kes ji me hîla li yê din neke.

Babekir dibe hakim û li wan temaşe dike. Melkê li yê qereçî vedigere:

- Emê niha hev û din tazî bikin. Ev dirav yan wê bi min ra derkevin û yan wê bi te ra derkevin. Diz yek ji me her du kesan e.

Qereçî aciz dibe:

- Bi wî serê te yê vala bikim, xelîtkî te bes ji aliyê te hatiye dizîn û nêta te heye ku tu nîqna (sûc) bixî stuyê min. Lê ev nîqên te wê derew derkevin. Tu pêşî xwe tazî bike. Ezê paş te xwe tazî bikim.

Dîsa miqeresiyê (munaqêşe) dest pê kir û kesî qebûl ne kir ku xwe pêşî tazî bike. Lê wek hemî kes dizane, merivên qereçî di axaftinê de xurt in. Melkê razî bû ku xwe tazî bike. Cilên xwe tev ji xwe kirin. Derpê tenê lê ma. Li qereçî vegeriya:

- De vê carê dora te ye. Tu xwe tazî bike.

Melkê cilên qereçî yeko yeko pê dide jêkirin. Li ser qereçî jî bes derpê dimîne. Melkê dixwaze ku qereçî derpê jî ji xwe bike. Lê qereçî vê yekê red dike.

- Bi serê bavê min tê wî derpê jî ji xwe bikî!

Lê qereçî jî ji qalibê xwe kêm ne dikir. Wî jî eynî tiştî ji Melkê xwest. Wî jî xwest ku Melkê derpiyê xwe ji xwe bike.

Dawiya dawî, her du merivên me hev û din çilp-tazî kirin. Ne li ser Melkê û ne li ser qereçî xelîtkî windabûyî derket. Paş vê yekê, her kesî rîya mala xwe girt û çû malê.



# D Î R O K A K U R D Î S T A N Ê D Î

B. Dema îslamî heta 1920

- III -

## KURD DI BIN XELÎFE Û BÛYIDAN DE (DÛMAHÎ)

### **HAZBANÎ**

Nêzîkî 281/894, gava ku Hamadan Ibn Hamdûnê Erebb (li Hamadaniyan binêre) li Mûsilê bi cih bû, Kurd ji hevalbendên wî bûn. Serhildana Kurdan ku, di 284/897 de, ji aliyê Ebû Leyla çêbû pirr dirêj ne bû (eynî eser, VII, 325, 337). Di 293/906 de, Kurdên Hazbanî, di bin serokatiya Muhammed Ibn Bilal de, navçeya Neynawa talan kir. Abdullah Ibn Hamadan, waliyê nuh ê Mûsilê, di dû wan de çû, lê li Ma'tûba hat şikestin. Bi alîkariyên ku ji aliyê xelîfê gihajtin, ew, piştî salekê, ket dû 5000 malîyên Hazbanî. Kurdan, ji bo ku zeman kar bikin, dest bi pêwendîyan kirin û xwe kişand Azarbaycanê. Abdullah vegeriya Mûsilê û, bi leşkerên nuh re, cardin çû dijî Hazbaniyên ku li çiyayê El-Salak (dibe ku Lahican be) xwe xurt kiri bûn. Hazbanî, û piştî wan êla Humeydî û rûniştevanên çiyayê Dasin, hatin bindest kirin (eynî eser, VII, 371). Di bin xelîfe El-Muqtedir de, Kurdan derdorên Mûsilê talan kirin, lê ji aliyê waliyê Hamadanî hatin ceza kirin; êla Celaliyan li hemberî wî ragirtineke (berengariyeke) pirr hişk kir (eynî eser, VIII, 118). Di 332/943 de, Miskawayh (Tecarib El-Umam, Gibb Memorial, VI, 105) li ser derbasbûna Huseyn Hamadanî ber bi Azarbaycanê dipeyive; di vê demê de, hevalbendê wî Cafer Ibn Şakkuya, serokê Hazbaniyên ku li Salmasê bi cih bû bûn, bû.

Nêzîkî vê demê, Daysam Ibn Ibrahim ku jîna wî ya tevlihev pirr girêdayî Kurdan bû derket meydanê. Ew bixwe lawê Erebekî û Kurdekê bû. Leşkerên wî, ji derveyî beşeke taybetiyeke daylamî, Kurd bûn. Daysam xaricî bû. Wî, piştî Yûsif Ibn Ebî El-Sac, Azarbaycanê stendi bû. O, di 327/938 de, wî Kurd bi kar anîn ji bo ku Laşkarî Ibn Mardî, yek ji efserên (zabit) Ziyarid Waşmgîr, biqewirîne. Lê Musafirid Marzuban, ku bi baweriyên xwe yê şîf hati bû nasîn, di stendina Azarbaycanê ji destê Daysam de serfiraz bû; û evê dawîn reviya ba hevalê xwe Hacîk Ibn El-Deyranî (=qralê ermenî yê Vaspurakan, Xacik-Gaxcik, kurê Deranîk). Paşê, rûniştevanên Tabrîzê bangî Daysam kir, lê ji nuh de, ew şikest û, bi iznê Musafirîdan, xwe kişand Tarum. Di 337 de, Marzuban û dîlê (esîr) Rukn El-Dewle'yê Bûyidî ku nûnerê xwe şand Azarbaycanê. Wê

çaxê, birayê Marzuban, Wahsûdan, Daysamê ku Kurd jê re xwebextker (fedakar) man anî bîra xwe, û ew şand dijî nûnerê Rukn El-Dewle. Daysam hat şikestin, lê li Arda-bûl û Barza ma. Gava ku Marzuban ji dîlîtiya xwe vegeriya, neçar (mecbûr) bû ku bireve, berê ber bi Ermenistanê, û paşê ber bi Bexdadê ku tê de Mu'izz El-Dewle bi comerdî lê nêrî. Ji bo ku hevalên wî ew dilezand ku vegere Azarbaycanê, ew çû ba Hamadaniyên Mûsilê û Sûriyê, ji bo ku ji wan alîkarî bixwaze. Di nehebûna Marzuban de, Daysam, di 344 de, vegeriya Salmasê û li wira xutbê bi navê Seyf El-Dewleyê Sûrî kir. Daysamê ku ji nuh de ji aliyê Marzuban hat qewirandin, ber bi hevalên xwe yê ermenî çû. Ibn El-Deyranî (Deranîk, lawê Xaçik bixwîne), li gel daxwaziya xwe, neçar bû wî bide destê Marzuban. Daysam hat kor kirin û li girtîgehê, di 345 de, mir (Tecarib, weşana Amedroz, I, 345, II, 148-51; Ibn El-Esîr, VIII, 289, 361, 375-7).

### **ŞEDDADÎ**

Di dema dîliya Marzuban de, li Ray, gelek waliyên serbixwe li Rojavaya Bakurê Farisistanê derketin meydanê. Yek ji wan (nêzîkî 340/951), Muhammed Şeddad Ibn Kartû, ji êla Rewadî ku paşê jê maliya qraliya mezin a Eyyûbiyan derket bû. Erdên bingehîn ên Şeddadiyan Dabîl û Ganca bûn. Şeddadî hevalbendên Bizantiyan û Selçûkiyan bûn. Di 465/1072 de, Ebû Suwar Anî ji bo kurê xwe yê piçûk, Manûçe, kirî. Ji vê demê, malbata qiralî di du şaxan de hat birîn: a Ganca û a Anî. Di 1124 de, Anî ji aliyê Gurcizan hat stendin, lê di navbera 520/1126 û 557/1161 de, û di navbera 1165 û 1174 de jî, Anî xwe ji nuh de di nav destên Şeddadiyan de dît. Mîrên gelek ronakbîr, evên dawîn eserên mi'mariyên giranbûha hiştin (li ARRAN, Dwîn, Ganca, Şeddad binêre); li çavkaniya ermenî di Lynch, Armenia, I, 363-7 de, û li van navan jî binêre: Barthold, ragihana wergerandina wî ya rûsî ya Muham. Dynasties, a Lane-Poole (St. Petersburg, 1899), 294; Barthold, Pers. nadpis'na.... meçeti Manûçe, Aniskaya Seriya, N° 5; N. Marr, Eshçe o slove "çelebi", M. Zapiski, XX (1911), 120; D. Ross, on three Muhammadan dynasties, di Asia Major, II, 2, (1925, 215) de.

Di 349/960 de, palêwawek (aşiq) li Azarbaycanê xuya bû. Navê wî Ishak Ibn İsa bû û piştî wî ji aliyê Fadl, serokê Kurdên

(\*) Encyclopédie de l'Islam, 1981. Wergerandin: Fransizî-kurdî: Pervîn.

# A N S Î K L O P Ê D Î Y A İ S L A M Ê D E

(\*)

Kahtanî (?) hati bû girtin, lê nahezê wî (merivê ku dijî wî), Castan Ibn Marzubanê Musafir, xwe dispart Hazbaniyan. Ishak zû da'wa xwe hunda kir (Tecarib, II, 179). Kurdan û Daylamiyan roleke giring jî di pevçûnên Castan bi birayê xwe Nasir El-Dewle re û di yên Ibrahim Ibn Marzuban bi biraziyê xwe Ismaîl Ibn Wahsûdan re lîzt (Tecarib, II, 219, 229; Ibn El-Esîr, VIII, 420-3).


## HESENWEYHÎ

Nêzîkî 348/959, di Cibal de, malbata qraliya duyemîna kurd (Lane Poole, Moham. dynasties, N° 57) jî nişka ve derket meydanê. Ew ji aliyê Hesenweyh (Hasanûya) Ibn Hesen (li Şerefname I, 20-3, jî binêre), serokê êla Barkîkanî (Barzînî) ku ji Rukn El-Dewleyê Bûyid re, di dema şerrê Xurasan de, kar kiri bû, hat ava kirin. Rukn El-Dewle ji bo Kurdan pîrr dilnêrm bû, û gava ku hinan li ber wî ji tevlihevkirinên wan gilî dikir, wî digot: "Kurd jî divên nan bixwun" (Tecarib, II, 281). Ibn El-Esîr (VIII, 519) pesna resena (esalet) Hesenweyh, hoşiyariya (bidiqqetbûn) wî ya rêzanî (siyasî) û zelalbûna rewîstê (exlaq) wî dikir. Gava ku Hesenweyh di 369/979 de, li paytexta xwe Sarmac (li Başûrê Bîsutûn) mir, Abdul-Dewle li erdên wî (Hamadan, Dînawar, Nihawand) geriya ji bo ku tê hukmê xwe bi cih bike; lê paşê, wî vî hukmî da Bedr Ibn Hesenweyh (360-405/979-1014) ku ji Abdul-Dewle re xwebextker ma û ku heta dijî birayên xwe yêr... derbas bûn aliyê

Fexr El-Dewle şerr kir. Xelife ji Bedr re navê Nasir El-Dîn El-Dewle da. Giraniya ku Dîrokzan didin Bedr pîrr mezin e: wî êla xwe ji nuh de gihand, (vergiyan) bi dadî (edalet) pay kirin, gundiyan paraztin (Tecarib, "Ebû Şuca" 287-99, 327; "Ibn Mu-hassin", 429, 449-54; Utbî, Kitabi Yamîni, wergerandina Reynolds, 424). Paşiyê Bedr, Zahir (Tahir?) bitenê salekê hukm kir, û di 406/1015 de, ew ji aliyê Şems El-Dewleyê Bûyid hat qewirandin. Apê Hesenweyh, Wandad, serokê şaxa Aşşiya, di 349/960 de mir. Birayê wî Abdûl-Xana'im di 350/961 de mir, û hinek şûn de keleyên lawê wî Ebû Selîm Daysam, dawîne vê xêza kêlekî, jê hatin stendin ((Kasan yan Kasnan "Kaslan? Nêzîkî Baba Yadiġar li Zohab", Xanim-Abad, û hwd).

Gelek caran, têkiliyên Ebdul-Dewle bi Kurdan re hebûn, lê ew bi wan re ji bavê xwe Rukn El-Dewle hişktir bû. Di 368/978 de Ibn Badoya'yê kurd, bi alîkariya Ebî Taxlîbê Hamadanî, bû waliyekî serbixwe li Ardamaşût (=Kawaşî, nêzîkî çiyayê Cûdî; Yaqût, I, 199), lê ew zû bi sozên Ebdul-Dewle hat xapandin (Tecarib, II, 392). Di 369 de, ewê dawî serê şerrekî dijî Kurdên Şehrezorê kişand, ji bo ku wan ji koçerên ereb ên Benû Şeyban ku bi zewac û bazarganiyê girêdayî Kurdan bûn veqetîne. Bajarê Şehrezorê hat vegirtin (işgal kirin), û Erebe vege-riyan çola xwe (Tecarib, II, 398; Ibn El-Esîr, VIII, 516).

Şerrekî din, di 370/980 de, dijî Kurdên Hekkarî ku dora wan hati bû girtin û ku



Nexşe 11.- Nexşa rêzanî ya Asya Pêşîn a ku firehbûna Kurdan nîşan dide.  
Les Kurdes, Basile NIKITINE, Edit. d'Aujourd'hui, 1978, r.183.

bi mercê (şert) ku ew neyên kuştin xwe teslîm kir, çêbû. Li gel vê qasê, serokê şerr wan li her du aliyên rê, di dirêjayiya pênc fersexan de, di navbera Ma'alsaya û Mûsilê de, xaç kirin (eynî eser, VIII, 521).

Cardin di jîna Ebdul-Dewlê de, serokê Humeydî, Ebû Abdullah Huseyn Ibn Duşanc (yan Ebû Şuca' Baz Ibn Dustak) ku bi navê Baz hati bû nasîn, giranî stendi bû. Ew, berê hertiştî, şivan bû; paşê, hêdî hêdî, ew bû serokê Arciş; Amid? û Mayyafarkîn. Serhildanek li Nasîbîn dubendiyekê di navbera wî û Samsam El-Dewle derxist. Baz leşkerê evê dawîn li Baculayê (li ser Xabûrê El-Huseyniyeh, di nahiya Kawaşî = Ardamust de) şikandin, Mûsilê stend û heta xwest ku bi ser Bexdadê biçê, ji bo ku serdestiya Bûyidan rawestîne; lê ew ji aliyê Samsam hat şikestin. Ew vegeheriya Mayyafarkîn, û bi lihevhatinekê bi kaptênê leşkerê ku dijî wî hati bû şandin stendina Diyarbekrê û beşa rojavayî ya Tûr Abdînê te'mîn kir (374/984). Baz çavên xwe ji Mûsilê ne kişandin, û di 379/990 de, weka ku wî jimareke mezin ji Kurdên Başnawî civandi bû, wî îcar di bin dîwarên vî bajarî de konên xwe danî bûn û pêwendiyina bi rûniştevanên wî re dikirin. Lê mîrên Hamadanî ku hîn nuh erdê xwe wiraset kiri bû, alîkariya Erebên Benû 'Ukayl te'mîn kir û dijî êrîşker şerr kir. Bûyerek Baz li derveyî şerr hişt û ew hat kuştin. Laşê wî hat xaç kirin, lê xelkê Mûsilê mafê gorkirina wî bi merasîmên adetî stend, ji bo ku Baz şerrê kafiran kiri bû (Ibn El-Esîr, IX, 25, 27, 38, 49; Tecarib "Ebû Şuca'", 83-4, 176-8; Ebûl Ferec, Muxtasar El-Duwel, weşana Pocock, 321-3).

Di 380/90 de, Samsam El-Dewle tecrube kir ku cihê xwe ji nuh de bistîne, û ji bo vê yekê bû hevalê Fûlad Ibn Munzir ku xwe dispart siwariya kurd ku li Şîrazê hati bû amade kirin. Piştî şikestina vê tecrubê, ew li penaberiya (iltica) li ba Kurdan geriya, lê evên dawîn piştîlêkirina wî (xiyanet) kir, û wî li ba Fexr El-Dewlê ku bi hezkirina Kurdan naskirî bû penaberî kir (Tecarib "Ebû Şuca'", 184; li ser Ibn Fûlad, li El-Utbî, eynî eser.424-5, binêre).

#### MERWANI

Maliya qraliya kurd a Merwaniyan (Zambaur, 136; Bosworth, The Islamic dynasties, 53-4) bi xurtî girêdayî Baz e. Piştî şikestina Mûsilê, Ebû Elî Ibn Merwan Ibn Dustak, ku ji xweha Baz û hevalbendê ewê dawîn çêbû bû, xwe kişand kela Kayfa ku tê de jîna daylamî ya Baz rûdinişt. Ew pê re zewicî û, yek bi yek, hemî kelên Baz stendin. Du caran, wî Ebû Ebdullahê Hamadanî ku Baz şikandi bû girt, lê bi nermî lê nêrî. Ibn Merwan li Diyarbekrê cih girt, û bi awayên xwe yên nerm rûniştevanan kişandin aliyê xwe. Merwaniyan ji 380/990 heta

489/1096 hikm kir. Hikmê wan ne bitenê li ser Diyarbekrê (Amed, Arzan, Mayyafarkîn, Hisn-Kayfa), lê li ser Xilat, Melazgerd, Arciş û nahiya Rojhilata Bakur ya gola Wanê jî fireh bû. Li Rojavayê, wan, ji bo demeke kurt, Urfê stendi bû. Ebû Elî Hesen, di 381/991 de, ket heta Sûriyê û vî welatî ji imperatorê bizantî Bazîl II stend. Ew di 387/997 de ji aliyê rûniştevanên Diyarbekrê ku serê xwe hilda bûn hat kuştin. Birayê wî, Ebû Mensûr Mumehhid El-Dewle ku, piştî mirina Baz, Mayyafarkîn stendi bû, li wê derê heta 402/1011 hikm kir (Ebûl Fida, Annales moslemici, weşana Reiske, II, 569). Birayê wî, Ebû Nasr Ehmed (Ibn Xallikan, I, 157-8), dû wî hat û ji 402 heta 453 hikm kir. Di 416/1025 de, wî Urfê stend, lê Bizansiyan li wira hikmê xwe, di 422/1031 de, danî (Ebûl Farac, 342). Wî navê mîrekî dad (adil), ronakbîr û çavekirî stendi bû, li gel ku wî xwe da bû kêfê. Di 442/1050 de, Ebû Nasr diviya ku di bin emrê Turxîlê Selçûkî bimîne. Law û paşiyê wî, Ebûl Kasim Nasr ku sernavê wî Nizam El-Dewle bû (453-72), hikm bi birayê xwe Seîd re (ku di 457 de mir) pay kir. Wî Herran, Suweyda, û hwd. ragihandin erdên xwe. Paşiyê wî, Mansûr Ibn Seîd ji 472 heta 489 bitenê bi nav hikm kir, lê ji 478/1085 generalê selçûkî Fexr El-Dewle Ibn Cahîr (li Cahîr, Benû- binêre) hema hemî erdên ku di bin hikmê atabegê Mûsilê (Ebûl Fida', III, 77-9, 87, 121, 125, 249) hati bûn danîn stendin. Li ser Merwaniyan, li lêhûrnêrîna taybetî (xusûsî) ya Amedroz, di JRAS, 1903, 123-54 de, binêre.

Berê vegirtina (işgal) tirkî bi demeke kurt, gelek nivîskar li ser mîrxasî û şerrên Kurdan nivîsîn. Di bin xelife El-Qadir de (381-422), dîrokzan mîrxasiya Ehmed Ibn El-Dehhakê kurd ku generalê imperator Bazîl II kuşt û ku, bi vî awayî, pêşveçûna Bizansiyan rawestand dibêjin (Tecarib, "Ebû Şuca'", 247). Di navbera 366 û 388/976-98 de, Kurd peşdar dibûn şerrên navbera Bûyid û Ziyariyan ji bo stendina Curcan (El-Utbî, wergerandina Reynolds, 298-302; Ibn Isfandiyyar, Gibb Memorial, 226-8). Piştî çend salan, Mehmûdê Xeznawî Kurd dijî Karaxaniyan bi kar dianîn (El-'Utbî, 33-).

Kurd beşdar dibûn şerrên birakuj ên Bûyidan, ên Benû 'Ukayl ji bo stendina Mûsilê û hwd. Di 411/1020 de, wan dijî leşkerên tirk ku li Hamadanê ser hilda bûn xwe radigirt. Di 415-20 de, wan li Farisistan û Xûzistanê dijî Bûyidê dawîn, Ebû Kalicar, şerr dikir (Ibn El-Esîr, IK, 100, 134, 226, 232, 239, 247, 249, 254, 265; Tecarib "Ibn Muhassin", 348, 376, 381). Bi vî awayî, gava ku unsurê kurd di şerrên bêjimar de diwestiya, leşkerên tirk aliyê nijadî (etnikî) yê Rojhilata Nêzîk bicarek diguherand.

Dûmahî heye



# GIYAYÊN HOV ÊN KURDISTANÊ

Berhevkirin: YALÇIN

Ev navên jêrîn ên giyayên Kurdistanê ne, ku ji ber xwe şîn dibin, ango bê ku meriv wan biçîne. Di hejmara wêbê de, emê wan çêtir bidin nasîn: awa, reng, bîn..... û çend wêneyên wan nîşanî xwendevanan bidin.

## A- Giyayên ku mirov dixwin

1--Babelîzik 2--Babil 3--Bêrazû 4--Bîyik 5--Catir 6--Dondelî 7--Ergurujû 8--Gêzbelû 9--Giyafîle 10--Goris 11--Gurmê 12--Heliz 13--Karî (kelehî, rîşî) 14--Kefçik 15--Kerbeş 16--Kereng 17--Ketyarî (keyar) 18--Mend 19--Nangê çûkê 20--Parpar 21--Pîspîzok 22--Pîvuk 23--Punk 24--Qiçî 25--Qurat 26--Qûzik 27--Reşad 28--Rêvaz 29--Rizyanik 30--Selmik 31--Sîrik 32--Sîrga pehn 33--Spind 34--Sterhik 35--Suryaz 36--Şekûnatik 37--Şepirze 38--Tilîga Zeynebê 39--Tirşok 40--Titlubaz 41--Têhnavik 42--Tolatirş 43--Tolik 44--Xerdel 45--Xitîk.

## B- Giyayên ku lawir dixwin

1--Beybûn 2--Birdî 3--Cekurî 4--Çavspiyok 5--Çeqçeçû 6--Çever 7--Çinarok 8--Çitî 9--Debuşû 10--Endeko 11--Firîz 12--Giyagana 13--Giyareng 14--Giyaresîk 15--Giyasînem 16--Giyaxwîn 17--Guharê hirçê 18--Guhreş 19--Gulgulu 20--Gunîfirşîk 21--Gunîzer 22--Gûnî 23--Giyagewr 24--Heliz 25--Hêrû 26--Kakilu 27--Karîş 28--Kawîr 29--Kelik 30--Kermex 31--Ket 32--Kulîlka çayê 33--Kulîlka spî 34--Kulîlka sor 35--Kulîlka xemrî 36--Kulîlka zer 37--Lavlavik 38--Lepkêgurî 39--Lîluz 40--Mambîl 41--Nefel 42--Nêrgîz 43--Pariyê mihê 44--Pepkê qirê 45--Pûjan 46--Pûşqulor 47--Qami 48--Qîvar 49--Qulingan 50--Quncirik 51--Raye 52--Rengê ruvî 53--Riha sûfî 54--Rîrus 55--Sendel 56--Soriyaza kuvî 57--Sorik 58--Stirîbeluq 59--Stirîzerik 60--Sîrise 61--Sûsin 62--Şafir 63--Şembelok 64--Şimamû 65--Şûşan 66--Tehlî 67--Tehlîşorik 68--Tirşuka ga 69--Tûzitehlik 70--Heçxeçok 71--Xurêl 72--Zilavgîr 73--Zilêhûr 74--Zirbacan 75--Zirvik 76--Zîvan.

## LI HOLANDA NAVENDIYA KURDISTAN VEBÛ



Di 7ê meha Kanûn 1985 de, roja şemiyê, li Holanda, bajarê Arnhem, "Navendiya Kurdistan" bi awakî fermî (resmî), ji aliyê serekê şaredariya (belediye) Arnhem, vebû.

Di vê roja vekirinê de pîrr kesên Kurd, Holandî û Tirk beşdar bûn. Gelek rojnamevan, televizyon, radyo, nûnerên partiyên siyasî yê Holandî beşdar bûn û axaftin.

Civaka ku hatibû roja vebûna Navendiya Kurdistan dilşa bû û gelek gul û diyarî pêşkêşî vê rêxistina nuh kirin.

Ji Têkoşer jî nûnerê beşdarî vê rojê bû.

# ALĪKARIYA CIVAKA BIYANIYAN

Derwêş (\*)

Awayê arîkariya civaka biyaniyan li Belçîka têr nake. Ji alîkî ve dewleta Belçîka ne xwediya rêzaneke biyaniyan e, ji alîkî din jî hînbûna xebatkarên civakî li ser bingehên Ewropî ye.

Di fêrkirina civakî û çaredîtina pirsan de, pirsên merivên biyanî û yên civaka ku ew jê tên nayên darîçav kirin.

## Cidabûnên çandî

Meriv dizane ku çandên gelên Belçîkî û biyaniyan cida ne. Bi kurtayî û awakî giştî çand tê gotina tevayiya adetên, disiplin, sembol û hebûnên civakî yên komekê (1). Çand mîrasa ku her nesl ji yê pêş xwe werdigre û dide yên paş xwe.

Di nav vê çarçewê de çanda biyaniyan di bin tesîra abor û ol (dîn) de bingeha xwe digre.

Ji sedema tesîra ola islamê, kêr guherîninê giring di abor û awayê civakî de tên dîtin. Ev tesîra fanatîk herweha xwe li ser adetên civakên ne-islamî di Rojhilata Navîn de ferz dike. Sedema vê yekê serdestiya gelên misilman li vê navçeyê ye.

Bi kurtayî, biyaniyên li Ewropa ji navçên belengaz tên. Di piraniya wan navçan de nexwendeyî zêde ye, tesîra ol li ser adet û disiplinê civakê mezin e, malbat ji aliyê mezinan (mêr) tê idare kirin û malbat bixwe mezin e (civak girêdayî hev e).

## Islam

Piraniya biyaniyên ji Rojhilata Navîn misilman in. Di vê dema dawîn de Suryanî, Ermenî û Êzîdî jî ketin nav biyaniyan. Ev her sê civak ji Kurdistanê, û komek piçûk jî ji Lubnanê, tên.

Lê wek ku tê zanîn, biyaniyên misilman di nav xwe de jî cida ne. Beşek ji wan sunnî, yê din şîî ye, û ew jî dîsa tên par kirin. Nîşe: di nav sunniyan de haricî (mewlewî, suleymanî, nurcî û hwd.), dahilî (şafiî, hanefî, hambelî, û hwd.), di nav şîîyan de haricî (bekdaşî, caferî û hwd.), dahilî (safewî, fatimî, nasirî û hwd.). Di her du aliyên de beşa hariciyan, dahiliyan misilman nayên pejirandin (qebûl kirin).

Di civakên islamî de, ol û jîna giştî

tevayiyek e. Zagonên (qanûn) islamê, di her alî de, dibin bingeha jîne.

## Pirsa zeman û saxiyê

Biyaniyên, zeman bi awakî din dinasin. Ji bo wan zeman fereh û bê dawî ye. Jimara seetan tiştêkî nenas e û ji bo vê yekê jî hinek zoriyan di civaka nuh de, li Ewropa, dibînin.

Kêmasiya tedbirên saxiyê li welatên wan û tunebûna hînkirinê dibin sedemên pirsên giring.

## Damezrana civakî

Tesîra abora xizan li welatên ku biyanî jê tên li ser damezrana civakî mezin e. Jîna meriv, an jî malbatê bi hemî civakê ve girêdayî ye. Merivên civakê ji hev berpirsiyar in. Tiştên ku civak baş dibîne baş e û tiştên ku civak suc dibîne suc e. Meriv bi serê xwe ne giring e. Herkes xwediye rolek e û pêwist e vê rola xwe baş bi cih bîne. Nîşe: wezîfa zilêm, jin, zarok (kur-keç), bûk, û hwd.

## Abor û rêzan

Wek ku berê hat gotin, biyaniyên li vira ji navçên xizan tên. Ev navçe li ser abora karê erd û xwedîkirina lawiran dijîn. Imkanên wan yên kar pîr kêr in. Di aliyê rêzanî (siyasî) de biyanî li welatên xwe rewşeke din nas dikin. Rêzanên welatên wan otoriter û leşkerî ne. Ev rewş jî li ser zihniyeta wan tesîreke cida dike.

## Hatina Ewropa

Destpêka hatina biyaniyan ji welatên Rojhilata Navîn di sala 1960 de bû. Hînga, hem welatên ewropî û hem yên ku karkeran rê dikirin, gomana demeke kurt dikirin ku wê karker paş çend salan vegerin welatê xwe. Lê wek dîrok şanî me dide ev yek ne bû û mayina biyaniyan li Ewropa tiştêkî mutlaq e.

Biyaniyan ne bes kar û keda xwe anîn Ewropa, lê herweha adet û disiplinê civaka xwe jî bi xwe ra anîn.

Cidabûna adet û çanda wan ji yên welatê nuh derdikevin meydanê. Rola malbata mezin

(\*) Ev gotar kurtenivîs û wergerandina têzeke ku min li Xwendegaha Bilind a Zanistiya Civakî li Leuven, îlon 1985, bi zimanê hollandî pêşkeş kir e.

(1) Kloos P., Antropolojîya Çandî, pêşgotin

biçûktir dibe û merivê biyanî dikeve bin gomana tenhayî û windabûnê. Ev yek jî dibe sedema tenêbûna malbata nuh a biçûk di nav civakeke biyanî de li welatê nuh. Damezrana maliyê û rolên kesan hêdî hêdî hunda dibin.

Rola jin û zarokan tê guhertin û ew jî dibe sedema zêdebûna rola zilêm ku bêtir otoriter dibe û malbat bi hemî hêza xwe adetên welêt diparêze û çanda nuh napejirîne.

Lê çî mixabin ku neslê duwemîn ku li vira mezin dibe bi awakî din difikire û dijî. Li mal adet û çanda dê û bav, li kuçe û dibistanan yên civaka nuh fêhr dibe. Ev yek jî dibin sedemên nexweşiyên di nav malbatê de û dê û bav ditirsînin. Tirsê wan ew e ku zarokên wan wê di nav civaka nuh de hunda bibin. Adetên bav û kalan wê ji bir bikin û yekcar hew li eslê xwe bipirsin.

Pirsê dina giring ev e ku ne dewlet û ne malbat ehemiyetê didin xwendina wan zarokan. Ew hê di destpêka mezinbûna xwe de bêşensên jînê ne. Rewşa keçên biyanî di vî alî de hîn jî zortir e.

#### Şexsiyeta Netewî

Cidabûnên di nav biyanî û gelên Belçîka de ne bes ji çand û ol tî. Cidabûnek din ku pirr giring e, şexsiyeta netewî ye.



Karkerên Kurd, Ermenî, Tirk, Ereb, Suryanî, Berber û hwd. ku hemî biyanî ne, lê ne hemî Tirk yan Ereb in, ji ber ku ew ji nav dewletên Tirkiyê û Fasê tî.

Li Tirkiyê, rewşa rêzanî xuya ye. Gelên ne Tirk di her alî de tî pelixandin. Tesîra pelixandina wan gelan li vira jî heye, heta li vira bixwe jî hinek zorî dibînin. Ev gel li vira jî ji piraniya mafên xwe yê dêmokratîk mahrûm in. Ji ber ku ew wek Tirk tî hesab kirin.

Mafên dêmokratîkên civakî, çandî û yê xwendinê li ber wan hatine birîn. Heta di aliyê hin tiştan de bêdadî (neheqî) jî li wan dibe.

Nîşe: Tirkan û Ereban mafên bernameyên televizyon û radyo, mafê xwendina zimanê Tirkî û Erebî di dibistanên pêşîn de girtine. Komelên wan alîkariyên baş ji hikûmeta Belçîka distînin. Di sendîke û rêxistinên din yê civakî de mafê berpirsiyariyê hatiye nasîn, û hwd. Lê karkerên wek Kurdan, Ermenyan, Suryaniyan û Berberan ji tevayiya wan mafan bêpar (mahrum) in. Li bavê yekê, dewlet wan neçar (mecbûr) dike ku şexsiyeta xwe ya netewî ji bir bikin û bitenê ji mafên ku ji Tirk û Ereban re hatine dayîn kar bikin. Nîşe: fêrên tirkî, erebî û yê quranê, dîrok û civaka Tirk û Ereban, di cihê yê xwe de.

Ev yek ji bo zarokên di dibistanê de rewşeke pirr bi tehlike ye. Ango, ev zarok li mal bi kurdî, yan jî bi ermenî diaxivin, bi hevalên xwe yê dibistanê re zimanê fransîzî yan flamanî (hollandî) û di fêrên xusûsî de ji bo zarokên tirk û ereb tirkî yan erebî fêr dibin û, bi vî awayî, tiştên ku hîn dibin bala wan nakişînin, û loma ew ji xwendinê hez nakin û dilê wan pê teng dibe.

#### Pêwendî

Cidabûn û zorî di vî alî de pirr in. Ev cidabûn û zorî dîsa bingeha xwe di çandên cida de dibîne. Bi awakî giştî em karin van awayên pêwendiyê bikin du celeb:

- 1- awayê civakî civak giring e.
- 2- awayê merivî meriv giring e

Biyaniyê dikevin koma yekemîn, ango axaftin û tebieta wan awayê civakî ye. Yê civaka Belçîka (herweha tevî Ewropa) jî dikeve nav awayê merivî. Li ser vê yekê, zoriyên pêwendiyê ewha tî xuya kirin:

#### Çandên civakî

- "em" giring e
- rol hene
- temen (imr) giring e.
- olî (dînî) ye

#### Çandên şexsî

- "ez" giring e
- rewş rolan diguhe-rîne.
- intellektualizm giring e.
- meriv azadtir û aktîf e.



- meriv pasîf e - "ez" biryar distîne
- di hemberî dora xwe ya nenas de girtî ye, ji gotina civaka xwe dernakeve. - di hemberê dora xwe ya nenas û nas de bê alî ye.
- "em" biryar distînin. - meriv wek xwe dike
- di nav civaka xwe de bi xwe bawer e - ziman vekirî ye; her kes têdigihêje
- ziman girtî ye; bes endamên civakê têdigihêjin.

Ev plan ne giştî ye. Di nav her du civakan de guhertinên ku meriv ji derve zû û baş nabîne çêdibin, û bi vî awayî, hêdî hêdî, awayên jînê û zihniyet jî diguherin.

#### **Nijadparêzî û dijminayîya biyaniyan**

Nijadparêzî stratêjiya parçekirina komeke (civak) kêmnas e. Ev rêzana dijî biyaniyan ji aliyê kербidestên dewletê imkanên xurtbûnê distîne. Bi vê yekê, sucê krîza aborî, pîrbûna bêkaran û pîrsên din yên civakî ku hikûmetên Belçîka û Ewropa ji wan berpirsiyar in, li ser milên biyaniyan tîn avêtin û bi vî awayî, tiştên ne rast li ser wan derdikevin.

Bêdadî (neheqî), dema ku merivek ji sedema cidabûna xwe ya fizîkî bi awakî din lê tê nêrin, xuya dibe.

#### **ÇEND PÊŞNEYAR JI BO ARIKARINEK BAŞTIR**

##### **A- Di aliyê xwendinê de**

Divê planekî çandên cida ji bo xwendinê bê bi kar anîn: Her kom eynî imkanan wergire û bi zimanê gelê xwe karibe arîkariyê di dibistanan de bistine. Divê her kom li ser dîrok, damezrana civakî, ol û rewşa welatê xwe bixwîne û fêr bibe.

Di aliyê din de pêwîst e ku:

- 1- Başkirina dan û standinên xwendegêhê û maliyên zarokan, ji bo ku malbatên wan jî bikarin rewşa zarokên xwe di xwendegêhê de bizanin.
- 2- Bi riya sistemeke pedagojîk ku ji destpêka xwendinê heta zanîngehê:
  - a) arîkariya xusûsî ji bo zarokên bi pîrs.
  - b) hem zarokên biyanî hem jî yên Belçîkî ji rewşa jîn, çand û ola her du aliyan agahdar bibin.
- 3- Pêwîst e ku mamoste ji rewşa biyaniyan li welatên wan û li vira agahdar be.
- 4- Pêwîst e ku dewleta Belçîka bi awakî fermî (resmî) plana çandên cida bipejirîne û arîkariya pêşveçûna wê bike.

##### **B- Temîna civakî**

Di vî warî de ti pîrs ji derveyî nenasîna sistema vê rêxistinê nîn in.

Meriv kare bi awayê gihandinan (eger pêwîst be, bi zimanên biyaniyan bixwe) vê sistemê bide nas kirin ku ji hin pîrsên sazgehî re çare bên dîtin.

##### **C- Rewşa kar**

Di demeke krîza aborî dîtina kar ji bo hemî kesî zor e. Ji bo biyaniyan ev yek hê zortir e. Sedema mezin ji nexwendinê û nezanîna zimanan e. Divê, dîsa bi riya gihandinan, fêrên zimên û imkanên meriv, çare ji van pîrsan re bên dîtin. Fêrên huner ku wezaretê kar dide di vî warî de cihekî giring digirin.

##### **D- Pîrsa xaniyan**

Rewşa biyaniyan di vî alî de girantir ji ya gelên vira ye. Ji ber ku xanî di destên rêxistinên xusûsî de ne û buhayê kirê pir giran e. Ev yek biyaniyan teşwîkê xaniyên erzan û ne xeş dike ku ne ji bo saxiyê û ne jî di aliyê xweşiyê de baş in.

Divê dewlet karibe belavkirina xaniyên vala kontrol bike û imkanên çareyên vê pîrsê bêtir bike.

##### **E- Saxî**

Di aliyê saxiyê de pîrsên biyaniyan bitenê di aliyê ziman û nezaniyê de hene. Mariv dikare:

- 1- xebatkarên saxiyê yên biyanî bide kar kirin.
- 2- dû û bavan di vî alî de bigihîne.
- 3- xebatkarên saxiyê yên belçîkî bigihîne ji bo ku ew karibin di nexweşgehan de bi biyaniyan re mijûr bibin.
- 4- alîkarî bide wergervanan ku broşuran bi zimanên biyaniyan, li ser saxiyê, bidin çap kirin.

##### **F- Rewşa biyaniyan di aliyê hiqûqî de**

Di vî warî de biyanî tê perçiqandin. Herçend e biyanî ji zû da li virin hinek ji şaredariyan (belediye) qeydiyên biyaniyan napejirînin (qebûl nakin).

Kontrola polîs di kuçan de, qedexekirina hatina hin malbatên karkerên biyanî, ketina polîs cihên vekirî (umûmî), zorbûna kirêkirina xaniyan ... hin ji van pîrsan in. Pêwîst e ku biyanî ji tevayîya mafên mirovî kar bikin û ew jî wek merivên welatê ku ew tê dijîn di aliyê hiqûqî de bên pejirandin.

Dûmahî heye

## 2 ŞEVÊN AGAHDARIYÊ

Di 12 û 13 Mijdar 1985 de, Têkoşer du şevên agahdariyê li ser Kurdistanê Iran û Iraqê pêk anîn.

Di şeva pêşîn de, bijîjkekî (doktor) belçîkî, Jan Meesters, diyapozîtivan li ser nexweşxaneke KDPI nişan dan. Dr Meesters berê çend mehan ji aliyê rêxistina Aide Médicale Internationale (Alîkariya Bijîjkiya Navnetewî) hati bû şandin ji bo ku li pêşmergeyên birîndar û kesên nexweş binêre. Di vî zemanî bixwe de jî, wî cuhanên kurd digihandin ku ew bixwe karibin bi pirsên sa-xiyê yê gelê xwe mijûr bibin.

Bijîjkekî din jî, Dr Michel-Yves Grauwîn, ku endamê AMI'ya Fransa û serokê AMIya Belçîka ye, li ser dijwariyên ku gelê Kurdistanê Iranê dikişîne û ku nahêlin ku ew di mercên (şert) qenc de jîna xwe pêş de bide peyivî.

Şeva duyemîn li ser Kurdistanê Iraqê bû. Me du filmên video pêşkeş kirin. Filmê

yekemîn belgeyî bû. Ew li London, ji aliyê Dengê Kurdistan hatiye çêkirin û dîroka têkoşîna Kurdistanê Iraqê nişan dide. Piştî pirs û bersivan, me filmê duyemîn, Kîne Em?, ku li Stockholm hatiye çêkirin nişan da. Bi saya vî filmê delal, huner-mendên giranbuha, weka Şivan, Gulistan, Mahmut Baksi, Melike Demirag .... û koma folklorê ya Swêdê çand û zargotina (folklor) kurdiya dewlemend ji Belçîkî û biyanîyan re dan nasîn.

Di her du şevan de, nêzîkî 150 kes, ku piraniya wan Belçîkî bûn, beşdar bûn. Wan gelek pirsan pirsîn û rewşa Kurd û Kurdistanê bala wan baş kişand. Rêxistina pirtûkan û xwarinên kurdî jî ji bo nêzîkkirina Kurd, Belçîkî û gelên din û xurtkirina pêwendiyên wan bi hevdu re gengazîyeke (wasîte) baş bû. Berê van şevan bi rojekê û di şeva yekemîn de, radyoya belçîkî, RTBF, vê xebatê weşand (li rûpel binêre).

## 2 SOIREES KURDES

LE BOTANIQUE - 236, rue Royale - 1030 BXL

Mardi, 12/11/85 20 h. - KURDISTAN d'Iran: diapositives.

Dr. Jan MEESTERS (A.M.I.)

+ débat

Mercredi, 13/11 - 20 h. KURDISTAN d'Irak. film documentaire.

+ débat

- film folklorique: Şivan et d'autres

---

Stand d'information et buffet kurde

Entrée: 100 F.B.

Organisateur: Têkoşer: Union des Travailleurs et Etudiants Kurdes en Belgique

# X E B A T A M E

## 7 I L O N

Şeva bîranîna Yılmaz Güney ku li Parîsê, ji aliyê Enstituya Kurdî hat pêk anîn. Çend endamên Têkoşer beşdarî wê bûn.

## 21 I L O N

Cardin şeva bîranîna Yılmaz Güney li Köln. Çend hevalên Têkoşer beşdarî wê jî bûn.

## 21, 22 I L O N

Cêjna salî ya rojnama partiya komunista belçîkî, Drapeau Rouge. Her sal, bi hezaran meriv beşdarî van du rojan dibin. Me di bin konekê de pirtûk û kasetên kurdî raxistin.

## 3 C O T M E H

Bi hinceta helbijartinên parlamana belçîkî ku di 13/10 de çêbûn, em beşdar bûn civîna çapê ya Mrax (Rêxistina dijî Nijadparêziyê) li ser giranbûna pirsên biyaniyan li Belçîka.

## 20 C O T M E H

Xwepêşandina (meşîn) mezin dijî çekên atomî. Nêzîkî 200.000 kes beşdarî wê bûn.

## 12, 13 M I J D A R

Me du şevên agahdariyê li ser Kurdistanê Iran û Iraqê, li navenda çandî "Botanique" ku girêdayî Wezareta Çandê ye, pêk anîn. Nêzîkî 150 kes beşdarî wan bûn (li rûpel 19 binêre).

## 23 M I J D A R

Şeva Komîta Flaman ji bo Piştgirtiya Dibistanên Bask. Nêzîkî 800 kes hatî bûn. Em bi raxistina pirtûkên kurdî beşdar bûn (li bajarê Gent).

## 28 M I J D A R - 2 K A N O N

Komisyona Ewropî ji bo Biyaniyan semînerê li ser pirsên cihê yê biyaniyên Ewropa, li Marlagne, nêzîkî Namur, pêk anî. Du endamên Têkoşer beşdarî wê bûn û daxwaziyên jêrîn pêşkeş kirin: divê ku hikûmetên ewropî cihêtiya Kurdan ji Tirkan bipejirînin (qebûl bikin), û bi vî awayî zimanê kurdî weka zimanekî dayikî ji zarokên kurd re li dibistanan bidin hîn kirin. Ji alîkî din jî me xwest ku di radyo û televizyonan de ji Kurdan re, weka ji gelên dinên biyanî re, berramên çandî, bi awakî muntazam bînin dayîn. Berpirsiyarên semînerê soz dan me ku vê pêşneyarê pêşkeşî Parlamana Ewropa bikin.

## 7 K A N O N

Em beşdar bûn vekirina Navendiya Kurdistan li bajarê Arnhem, li Hollanda. Ev Navend bi awakî fermî (resmî) ji aliyê vê şaredariyê (belediye) hatiye pejirandin (li rûpel 15 binêre).

## 20 K A N O N

Endamek ji Têkoşer li Xwendegeha Bilind a Mamosteyan, li bajarê Anvers, ji nêzîkî 100 xwendekarên vê Xwendegehê agahdariyê li ser Kurdistanê da.

## 27 K A N O N

Bi hinceta (munasebet) 30 saliya Şivan, li ser daxwaziya Enstituya Kurdî ya Parîsê, Têkoşer şeveke çandî li salona Claridge, li Bruxelles, amade kir (li rûpel 21 binêre).

## D I M E H Ê D E C A R E K Ê

- Civîn bi berpirsiyarên Universitê de Paix (Zanîngeha Aştîyê) û komeline din ku bi mafên mirovan û gelan mijûr dibin.

- Civîn bi komelên civakî û çandî ku li şaredariya St-Josse, li Bruxelles, dixebitin.

## J I A L I Y Ê W E Ş A N Ê

### R A D Y O:

11 M I J D A R: Bi hinceta her du şevên agahdariyê, yê 12 û 13 Mijdarê, radyoya fransîzî, RTBF, berrama Points de Mire, niv seet hevpeyvînekê bi endameke Têkoşer re kir, stranên kurdî yê Şivan û Temo weşandin û her du şevan çend caran îlan kirin.

12 M I J D A R: Rojnamevanek ji radyoya RTBF beşdar bû şeva agahdariyê ya pêşîn, bi her du bijîjkên Ewropî û endameke Têkoşer re hevpeyvînekê çêkir û şeva duyemîn îlan kir.

### T E L E V I Z Y O N:

22 K A N O N: Televizyona flamanî BRT, berrama biyaniyan BABEL, nêzîkî deh deqge ji bo Kurdan veqetandin. Di destpêkê de, çend perçên ku ji televizyona almanî hatine stendin nîşan da, û paşê bi me re hevpeyvînekê çêkir. Eger ev bername pirr kurt be jî, ji bo Kurdan bûyereke giring e, ji bo ku em tê de, ji bo cara yekemîn bi kurdî dipeyivin.

T E L E V I Z Y O N A F R A N S I Z Î: ev televizyon perçeke ji axaftina me ya kurdî di televizyona flamanî de nîşan da.



## NIVISAR:

Bi hinceta (munasebet) cêjna sersalê, kovara dijî nijadparêziyê, l'Anti-Raciste, bi me re hevpeyvînekê li ser sersala Kurdan NEWROZ, çêkir.

RADYOYA AZAD: Her yekşem, ji seet 13 heta 15, bi kurdî, fransîzî, tirkî û flamanî.

\* \* \* \*

## BERHEVKIRINA DOKUMANAN LI SER KURDAN

- Kurdische Grammatik, **Fernand Justi**, Kaiserlichen Akademie der Wissenschaften, 1880 (çapa nuh: Hans R. Wohlwend Schaan/Liechtenstein, 1983).

- Kurdish Dialect Studies, I, II, Oxford University Press, 1961, 62 (çapa nuh: School of Oriental and African Studies, University of London, 1981).

- The Kurds, Minority Rights Group - Report N° 23, London 1948.

- Der Kurdengau, **Dr Maximilian Bittner**-Akademie Der Wissenschaften, Viêna, 1896.

- Kurdistan, the Search for Recognition - **Richard Sim** - Conflict Studies. The Institute for the study of conflict, N° 124, November 1980.

- La question kurde - **Dr Chukru Mehmed Sekban** - Les Presses Universitaires de France, 49, Blv. Saint-Michel, Paris (bê tarîx).

- Betrachtungen über die ethnische Identität der Iranischen Kurden, **Taghi Habibi Shalmani**. Inaugural-Dissertation zur Erlangung der Doktorwürde der Philosophischen Fakultät der Universität zu Köln, Köln 1985

- Agha, Shaikh and State. On the social and political organization of Kurdistan. **M. M. Van Bruinessen**, 1978.

- Prehistoric investigations in Iraq Kurdistan, **Robert J. Braidwood and Bruce Howe**. The Oriental Institute of the University of Chicago - Chicago 1960.

- Ich war bei den Kurden, **Fritz Sitte**, Verlag Styria Graz, Viêna, Köln, 1980.

- Bohtan, I, II, Eine topografisch-historische studies, **Martin Hartmann**, Berlin 1896, 7.

- Zur geographie des Tur Abdin, **A. Socin**, 1873.

- Sasun und das quellengebiet des Tigris, **Wilhelm Tomaschek**, (bê tarîx).

- Nairi E Ur (U) Atari, Contributo Alla Storia Della Formazione Del Regno Di Urartu, **Mirjo Salvini**, Roma, Edizioni Dell'Ateneo, 1967.

- The Nestorians and their Muslim Neighbors, New Jersey, 1961.

- Hurrians and Subarians **Ignas J. Gelb**. University of Chicago, 1944.

- Les Yézidis, **M. Joachim Menant**, Paris 1892.

## **Cejna 30 saliya Şivan**

Bi daxwaziya Enstituya Kurdî ya Parîsê, Têkoşer di 27 Kanûn 1985 de li Bruksel şeva pîrozkirina 30 saliya hozanê kurd Şivan Perwer amade kir.

Di bernama cejnê de Şivan Perwer, Gulistan, Melike Demirag, Emekçi, Orhan Temur, Feqiyê Teyra (Nizamettin Ariç) û pêşkeş Mahmut Baksi hebûn. Lê çî mixabe ku Melike Demirag, Emekçi, Orhan Temur û Feqiyê Teyra beşdarî vê şevê nebûn. Lê Xusrew, dengbêjê Kurdistanê Iranê, hat.

Serokê Enstituya Kurdî ya Parîsê, Kendal Nezan, û xanima Yilmaz Güney, Fatoş, axif-

tin, xweşhatina mêhvanan kir û 30 saliya Şivan pîroz kir.

Her çend e ku hin ji hozanên bernamê ne hatibûn jî, konsera me bi awakî baş bi ser ket. Mêhvan bi stranên Xusrew Bager, Gulistan û Şivan Perwer şah bûn. Gelek silavname ji komele û partiyên demokratîk hatin û komelên kurd, tirk, ereb û belçikî pirtûkên xwe raxistin.

Nêzikî 750 kes beşdar bûn vê şevê û mêhvan bi pêşkeşiya nivîskar û rojnamevanê kurd, Mahmut Baksi, pîr dilxweş bûn û henekên wî ew gelek dikenandin.

# T ÊKOŞER'DEN HABERLER

## 7 EYLÜL

Paris'te Kürt Enstitüsünün düzenlediği "Yılmaz Güney'i Anma Gecesi"ne Têkoşer'den bir kaç temsilci katıldı.

## 21 EYLÜL

Federal Almanya Kürt Enstitüsünün Sosyal Demokrat Parti ile düzenlediği "Yılmaz Güney'i Anma Gecesi"ne Têkoşer'den bir kaç arkadaş katıldı.

## 21-22 EYLÜL

Belçika Komünist Partisi yayın organı olan "Drapeau Rouge"un iki günlük bayramına kitap ve kaset sergimiz ile katıldık. Bayrama her sene binlerce insan katılıyor.

## 3 EKİM

30 Ekim'de olan Belçika Parlemtosunun seçimleri dolayısı ile MRAX (İrkçılığa karşı bir kuruluş)'ın Belçika'daki yabancı uyruklu kitlenin büyüyen sorunlarını konu edinen toplantısına katıldık.

## 20 EKİM

Atom silahlarına karşı düzenlenen büyük yürüyüş. Aşağı yukarı 200.000 kişi bu yürüyüşe katıldı.

## 12-13 KASIM

İran ve Irak Kürdistanını konu alan iki informasyon gecesi düzenledik. Kültür Bakanlığına bağlı "Botanique Kültür Merkezi"nde düzenlenen gecelere 150 ye yakın kişi katıldı. (Daha çok bilgi için sayfa 19 bakın).

## 23 KASIM

Bask okullarını desteklemek için Flaman Komitesinin gecesi. 800 kişinin katıldığı geceye kitap sergimiz ile katıldık.

## 28 KASIM-2 ARALIK

Avrupa Komisyonu, Namur'a yakın Marlagne'de Avrupa'daki yabancılar ile ilgili bir seminer hazırladı. Têkoşer'den iki temsilci katıldı ve şu önerileri sundular: Avrupa hükümetleri Kürtlerin Türkler'den ayrı bir halk olduğunu kabul etmelidirler, okullarda Kürt çocuklarına anadilleri Kürtçe öğretilmelidir.

Diğer yandanda, isteğimiz şu, Avrupa'daki Kürtler için radyo ve televizyonlarda, diğer milliyetlere verildiği gibi, muntazam bir şekilde kültürel kürtçe program hakkı verilmeli. Seminerin sorumluları, önerilerimizi Avrupa Parlemtosuna götüreceklerini söylediler.

## 7 ARALIK

Hollanda'nın Arnhem şehrinde "Navendiya Kürdistan"ın açılış törenine katıldık. Bu merkez, Arnhem belediyesi tarafından resmen açıldı. (Daha çok bilgi için 15 bakınız).

## 20 ARALIK

Têkoşer'den bir arkadaş, Anvers'te Yüksek Öğretmen Okulunda Kürdistan ile ilgili bir konuşma yaptı. Aşağı yukarı 100 kadar dinleyici vardı.

## 27 ARALIK

Kürt ozanı Şıvan Perwer'in 30 doğum yılı dolayısı ile, Paris Kürt Enstitüsünün arzusu üzerine, Têkoşer Brüksel'de Claridge salonunda kültürel bir gece hazırladı. (Daha çok bilgi için sayfa 21 bakınız).

## AYLIK ÇALIŞMALAR

-Barış Üniversitesi ( Université de Paix ) ve insan haklarını savunan çeşitli kuruluşlar ile yapılan toplantılar.

-Brüksel, St. Josse'un sosyal ve kültürel kuruluşları ile yapılan toplantılar.

## YAYIN ALANINDA

### RADYO

11 KASIM: 12 ve 13 Kasım'da olan informasyon geceleri dolayısı ile RTBF radyosu'nun Points de Mire programı Têkoşer'in bir üyesi ile yarım saatlik bir repörtaj yaptı. Repörtaj yayını esnasında Şıvan ve Temo' - dan parçalar sundu.

12 KASIM: RTBF'ten bir muhabir informasyon gecemize katılarak konuşmacı iki doktor ve Têkoşer'den bir arkadaş ile bir repörtaj yaptı ve ikinci informasyon gecesini yaptığı repörtaj ile beraber yayınyadı.

### TELEVİZYON

22 ARALIK: Flaman televizyonu BRT'nin BABEL programı 10 dakikasını kürtlere ayırdı. Alman televizyonundan aldıkları parçalarla Têkoşer ile yaptıkları repörtajı yayınladılar. Program kısa olmasına rağmen Kürtler için böylesi bir programın önemi büyüktür. Çünkü Belçika televizyonunda ilk olarak dilimiz Kürtçe ile konuştuk. Yapılan Kürtçe konuşmalarımızın tercümelemleri Flamanca ile yapıldı.

FRANSIZ TELEVİZYONU: Flaman televizyonu i-Te yaptığımız Kürtçe konuşmaların bir bölümünü Fransızca dipnotlar ile beraber naklen yayınladı.

BASIN: Yeni yıl münasebeti ile ırkçılığa karşı yayınlanan dergi "L'Anti-Raciste" bizim ile Kürt ulusal bayramı NEWROZ hakkında bir repörtaj yapıp yayınladı.

SERBEST RADYO: Her pazar günü, saat 13 ten 15 kadar Kürtçe, Fransızca, Türkçe ve Flamanca radyo yayını yapıyoruz.

## KÜRTLER İLE İLGİLİ BELGELERİN TOPLAMASI:

(Sayfa 21'e bakınız).

## ax ji derdê van bêbextan

Ji Diyarbekra qehreman  
Têye dengê kûr û giran;  
Nalîna xortan,  
Qîrîna jinan,  
Axe-kufa belengazan; ax,  
Ax ji derdê van xwînrijan,  
Van nezanan, van bêbextan;  
çiqê paşve mane, ax.

Ji Sowêto ya qehreman  
Têye dengê kûr û giran  
Tijî êş û jan  
Ji derdê dizan;  
Dibin ser û binê erdê; ax,  
Ax.....

Ji Selvedora qehreman  
Têye dengê kûr û giran;  
Faşist har bûne,  
Dirjînin xwînê;  
Nedizanin mirovîtiyê; ax,  
Ax.....

Ji Filistîna qehreman  
Têye dengê kûr û giran;  
Jinek digrî ye,  
Lawik mirî ye;  
Ew jî wek bavê wî kujtin; ax,  
Ax.....

Ji Mehabada qehreman  
Têye dengê kûr û giran;  
Mindal sêwîne;  
Qîrîn û şîne;  
Bavên mîrxas canfîda bûn; ax,  
Ax.....

Lê hemû beşên cîhanê  
Wek gelê l'Kurdistanê  
Hinek digrîne,  
Birçî û tîne;  
Hin jî firoj hîn bindestin; ax,  
Ax.....

Şahîne Sorekli  
Sydney, x1.84

### KURŞUN NEYLESİN TÜRKÜYE ?!..

"Yurdumuzdaki karanlığın aydınlığa çevrilmesine ufacak bir katkımız olsun diye hazırladık bu kaseti. Sağlanacak gelirin tümü insan hakları ve demokratik özgürlükler için yapılan çabalara harcanacak. Siz de onu satın alarak, dostlarınıza duyurarak bize katılabilir, çalışmanın bir ucundan tutmanın mutluluğunu paylaşabilirsiniz..."

Toplu siparişler için  
başvuru - Ji bo daxwazên zêde :

"Demokrat Sanatçılar"-  
(Hunermendên Demokrat)  
Quellenstr. 82  
5357 Swisstal 1  
B.R. DEUSCHLAND  
Tel. (0)2254 - 6821



### BER ÇI DİKARE BİKE JI LAWİJÊ ?!..

Me ev kaset amade kîr ku bibe alîkariye-keke biçuk ji bo li welatê me ronahî bikeve cihê tariyê. Ewê giş hatina vê kasetê di ber têkoşîna ji bo mafên mirovan û mafên demokratîk bîn xerc kirin. Hun jî bi kirîna vê kasetê û bi nasdana wê li ba dostên xwe tevî me bibin, dilxweşiya di nava xebatê de par bikin..."

Hunermendên Kurd û Tirk  
Kürt ve Türk sanatçılari :

Delal, Emekçi, Gulistan,  
Heval, Mehmet Koç, Melike  
Demirağ, Nedim Hazar, Ni-  
zamettin Arıç, Orhan Temur,  
Rıza Aslandoğan, Tahsin  
İncirci, Şivan Perwer  
Tulay German, Ufuk Adalı.

Not: Ji bo daxwazên yek yek, em hevî dikin ku hun wa ji komelên demokratîk ên nêzîkî we bixwazin.

Tek tek istekler için, çevrenizdeki demokratik derneklerden başvurmanızı rica ederiz.



